CEJNA WE PÎROZ BE!
ROŞANÊ ŞIMA PÎROZ BO!
CEJINTAN PÎROZ BÊT !

# Bi girankirina tecrîdê bersiv dan



Gelê kurd coş û dildariya xwe ya ji bo çareseriyeke demokratîk û aştiyane anî ziman. Ji bo pêkhatina aştiyê li her derê daket kolanan. Dewletê bi tecrîda giran a li ser Ocalan û êrîşên nijadperestan bersivê dide

### MUAMELEYA REHÎNEYÊ ŞER LI OCALAN DIKIN

Bêtehamuliya dewleta tirk a li hemberî şanazî û kêfxweşiya gelê kurd bi pêkanîna tecrîd û êrîşên nijadperest bersiv da. Li ser navê sererastkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li girtîgeha Îmraliyê tecrîd hate girankirin. Hucreya ku Ocalan tê de tê hiştin hate guhertin û ew neqil kire hucreyek 6 metrekareyî.

### BERHEVKIRINA PIRTÛKÊ JI BO GEL MESAJEK BÛ

Wekî tê zanîn Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku berê di hucreyeke 12 metrekareyî de dihate hiştin li hemberî vê pêkanînê, bi westeya parêzerên xwe ragihand ku şert û mercên wî hatine girankirin. Dema gelê kurd nerazîbûna xwe ya ji bo vê yekê dianî ziman; li Wanê dadgehê biryara berhevkirinê ji bo parêznameyên Ocalan da... RÛPEL - 5

## Alinak: Zamanê ez tehdîd kirim

Parlamenterê berê Mahmut Alinak diyar kir rojnameya Zamanê roportaja ji wî girtî kêm û şaş daye û ji ber vê li dijî vê yekê derketiye ji rastî gefa, "Qeyda dengê te di destê min de heye. Tê propagandaya PKK'ê kiriye, Kurdistan gotiye. Em biweşînin dê tengasiyên mezin ji te re derkevin" li wî kiriye. Alinak anî ziman ku wî ji xwestiye tevahiya roportajê bê weşandin û li pişt gotinên xwe ye.



ROJEV
27 Mijdar - În 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 15

### Berê ji ceza li parêzer Bîlmez biribûn

Beriya mehekê jî Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê bi boneya agahiyên parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di hevdîtinan de dayîn muwekîlê xwe di çarçoveya doza hatiye vekirin de 6 sal 4 meh ceza li parêzerê Ocalan Îbrahîm Bîlmez biribû.

## Îro Cejna Vejîna Gelê Kurd 27'ê Mijdarê û Cejna Qurbanê bi hev re tê pîrozkirin



## Li Almanyayê rojên fîlmên kurdî

Li Almanyayê Mîhrîcana Fîlmên kurdî dest pê kir û mîhrîcan dê 29'ê mijdarê bi dawî bibe. Li Frankfurt û Ingolstadtê yên Almanyayê 4'emîn Mîhrîcana Fîlmên Kurdî dest pê kir. Di çarçoveya rojên fîlmên kurdî de li her du bajaran jî mîhrîcan dê di heman rojê de dest pê bike... ÇAND R11



## Parlamentoyê xelat da 'Welcome'

Fîlmê derhêner Philippe Lioret ya bi navê 'Welcome' ku mijara wê penaberî û evîna du ciwanên kurd e xelatek ji ji Parlamentoya Ewropayê wergirt. Di fîlmî de mijara nêzîkahiya hikûmetê ya penaberan û cezayên ku li kesên alîkariyê didin wan tê birîn derketiye pêş... ÇAND R11

# CEJNÊN WE PÎROZ BIN!

Îsal roja salvegera PKK'ê 27'ê Mijdarê û Cejna Qurbanê rastî heman rojê hatin. Kurd ji aliyekî ve Cejna Vejînê pîroz dikin, li aliyê din jî bi xemgînî û di nava şer de Cejna Qurbanê pêşwazî dikin

### KCK'Ê HER DU CEJN PÎROZ KIRIN

Îro du cejn ji bo kurdan bûn yek roj. Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê, 31'emîn salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê û cejna Qurbanê ya cîhana misilman bi daxuyaniyekê pîroz kir û dilsoziya bi şehîdên têkoşîna Azadiya Kurd re anî ziman.

### 'EM Ê JI BO AŞTIYÊ ISRAR BIKIN'

KCK'ê, destnîşan kir ku, hêzên navneteweyî bi hêzên herêmê re bûne yek û xwestin ku gelê me bikin qurbanê berjewendiyên xwe, lê bi têkoşîna PKK'ê û gelê kurd, ev bextreşî hate berterefkirin û di qonaxa îroyîn de, di aştiyeke bi rûmet de jî israr dike.

### AYNA Û TURK CEJN PÎROZ KIRIN

Hevserokên DTP'ê Ahmet Turk û Emîne Ayna di peyama xwe de xwestin ku Cejna Qurbanê ji biratî, aştî, û azadiyê re bibe wesîleyek. Hevserokan diyar kirin ku ji bo cejneke rastîn divê pevçûn bi dawî bibin. Di peyamê de hat gotin ku derfetên aştiyê ji her demî zêdetir in... RÛPEL - 5

## PKK'ê bi berxwedana zîndanê kefen çirand

Çîroka PKK'ê ji axaftina yekem, civîna yekem, guleyê yekem û koma yekem a gerîla re bi lez û bez kete ser riya pêşketinên mezintir. Êdî bi awayekî girseyî dadiketin meydanan. Li dijî vê zilmê, li dijî îşkence û hewldanên teslîmgirtinê, li dijî bê îradekirinê, Mezlûm Dogan bi fedakirina laşê xwe, Çaran bi agirê bedena xwe, Xeyrî Durmûş, Kemal Pîr, Akif Yilmaz û Alî Çîçek bi ruhê xwe agir geş kir... DOSYA - R.2




## Li Mexmûrê jin bi girseyî meşiyan

*Bi armanca 25'ê Mijdarê Roja Hevgiriyê û Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinê ya Navneteweyî jinên penaber ên li Mexmûrê mîtîngek li dar xist. Piştre Seroka Meclîsa Gel Nuran Sezgin axaftinek kir û got: "Di cîhanê de kesên herî zêde jinê diparêze û maf dide jinê Rêber Apo ye û ji bo rizgariya gelê kurd û rizgariya hemû gelên bindest têdikoşe. Li gelek bajaran jî çalakî pêk hatin...* RÛPEL - 9

## Li Çanakkaleyê jî ciwanên kurd lînc kirin

*Li taxa* bajaroka Bayramîça Çanakkaleyê li ber otogarê 4 ciwanên kurd jî xwestin berevahiya pevçûnekê bikin û li ser vê yekê bi polîsan re nîqaş kirin. Di encama nîqaşê de polîsan li Tamer Demîr, Tîmur Ozkan, Ceyhun Gormuş û Mehmet Bajaran xistiye. Lêdana polîsan di demek kin de bi beşdariya kesên li derdorê vegeriya lînca 4 ciwanên kurd... RÛPEL 3



## Di çar salan de 39 êrîşên lincê pêk hatin

*Êrîşa* dawî ya lîncê ya li dijî kurdan li bajarê qaşo hemdem a Îzmîra Tirkiyeyê pêk hat. Di dema desthilatdariya AKP'ê de li bajarên tirkan êrîşên li hemberî kurdan zêde bûn. Di nava 4 salên dawî de li hemberî kurdan 39 bûyerên linckirinê pêk hatin. Herî dawî li Çanakkaleyê nijadperestan êrîşî kurdan kir. Hê jî rayedar êrîşan teşwîq dikin... RÛPEL - 3

Rojev



DOSYA
DESTANA VEJÎNÊ PKK -II-
NAVENDA NÛÇEYAN

## Huner û çandeke nû afirand

PKK'ê di warê afirandina huner û kesayetiyên nû de jî dereng nema. Di sala 1983'yan de bi avakirina Hunerkomê re di warê hunerî de jî hemleyek pêk anî û di vê riyê de gelek şehîdên hunerê çêbûn: Hozan Sefkan, Hozan Serhed, Mizgîn, Hogir, Çiya, Sarya, Şanoger Hêvî, Alî Temel, Halîl Uysal, Delîla û gelek hunermendên din.

### DESTANA PKK'Ê KU JI YEKÎ DEST PÊ KIR GIHÎŞT BI MILYONAN

# Berxwedan veguherî serhildanan

**Çîroka PKK'ê ji axaftina yekem, civîna yekem, guleyê yekem hwd. kete ser riya pêşketinên mezintir. Êdî bi girseyî dadiketin meydanan**

Li dijî vê zilm û zorê, li dijî işkence û hewildanên teslîmgirtinê, li dijî bê îradekirinê, Mezlûm Dogan bi fedakirina laşê xwe, Çaran bi agirê bedena xwe, Xeyrî Durmûş, Kemal Pîr, Akif Yilmaz û Alî Çîçek bi ruhê xwe, jê re dibêjin "Bisekine!"

**Kawayê Hemdem**

Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Mazlûm Dogan, li hemberî zilm û zora li girtîgeha Amedê, zexta li ser hezaran ciwanên kurd qebûl nake. Sala 1982'yan, şeva 20 adarê ku dikeve ser 21'ê adarê yanî berbanga roja Cejna Neteweyî Newrozê, sê darikên kibrîtê bi boneya sembolîzekirina agirê Newrozê pê dixe û paşê jî canê xwe feda dike.

Mazlûm Dogan ku wekî "Kawayê Hemdem" tê nasîn, rêbaz û kevneşopiya berxwedana Pîr Sultan Abdal, Helacê Mensûr, Nesîmî û Seyîd Riza jî şopandiye...

**Semaya Agirîn a Çaran**

Meha gulanê ji bo gelê kurd, meheke dîrokî ye ku tijî bûyerên dîrokî tê de rû dane û gelek tişt qewimîne, gelek berxwedan pêk hatine. Ji bo kurdan mehek e ku li dijî wan zilm û zordarî pêk hatiye... Lê ew xweşî û bedewiya meha gulanê, ew bêhn û germahiya mehê, ew rengên cur bi cur ku di nava xwezayê de şoreşekê pêk tîne, tu carî nagihêje nava çar dîwarên zindanê, jixwe qet ne mumkûn e ku bigihêje girtîgeha nimreya 5'an a Amedê...

Qehremanên ku wekî "Çaran" têne naskirin, yanî Ferhad Kurtay, Mehmûd Zengîn, Eşref Anyik û Necmî Oner li dijî vê zilm û wehşetê, li dijî wê barbariyê, ji bo ku hovîtiya li hemberî jin, zarok û li hemberî gelê kurd pêk dihat, protesto bikin, ketin nava çalakiyê. Di 18'ê gulana 1982'yan, de laşê xwe dan ber agir û xwe feda kirin.

**14'ê Tîrmehê**


Agirê laşê Çaran têra bidawîanîna zilma li girtîgeha Amedê nake. Hewil didin ku qat bi qat zêdetir teslîmiyet û xiyanetê li girtîyan ferz bikin. Lê belê vê carê Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Alî Çîçek û Akîf Yilmaz dadikevin meydana berxwedanê.

Berxwedana 14'ê tîrmehê, li dijî derbeya leşkerî û faşîst a 12'ê Îlonê, bendaveke polayîn e. Bi vê bendava ji pola, rûmet, namûs û şerefa gelê kurd hate parastin. Polîtîka û hedefa dijmin a tunekirin û ji holêrakirina gelê kurd, bi vê berxwedanê hate pûçkirin...

Berxwedana 14'ê tîrmehê, çîroka komek berxwedêr e ku bi berxwedana xwe ji nû ve dîroka mirovahiyê nivîsandin. Berxwedana 14'ê Tîrmehê bangek dîrokî bû ji bo gelê kurd û ku bi tîpên zêrîn wiha kete nava rûpelên dîrokê û digot: "Bi xwe bawer be, li ber xwe bide, têbişoke û têkoşînê xurt bike, di şert û mercên herî dijwar de jî tê bi ser bikevî".

**Ji nû ve vegera bo Welat**

PKK'yiyên ku li çolên ereban, li Filistînê, li Şam, Heleb û li Rojhilata Navîn belav bûbûn, hêdî hêdî berê xwe dan welatê bav û kalan, berê xwe dan welatê dayika xwe ku hêza jiyanê dida wan, berê xwe dan axa pîroz, ango vegeriyane Kurdistanê...




*Ev afîş di sala 1984'an de ji bo pêşengên PKK'ê M. Dogan, K. Pîr û M.H. Durmuş ve hatiye çêkirin.*

Bi hesreta bêrîkirina û hezkirina ji axa xwe, ji çar aliyê cîhanê berê xwe dan welat. Ji diyarên xerîb, ber bi Botan, Gabar, Cûdî û Agirî ve ketin ser rê. Pêşî derbasî Botan, Gabar, Cûdî, Qesrikê û ji wir jî li her derê axa Mezopotamyayê belav bûn bêyî ku biwestin, bêyî ku bikevin dudiliyê, bêyî ku guhê xwe bidin, şev û rojan, berf û baranê, havîn û zivistanê xwe berdana nava dilê axa pîroz û derketin çiyayên Kurdistanê...

Di vê rêwîtiyê de li Qendîlê, Mehmed Karasûngûr û Îbrahîm Bîlgîn di encama xiyaneta navxweyî de bûne hedefa hin kesên xayîn. Piştî hingê jî Şahîn Kilavûz tevî 8 rêhevalên xwe ketin çemê Hêzilê û jiyana xwe ji dest dan.

**15 Tebaxê**

Di roja 15'ê Tebaxa 1984'an de, gelê kurd li dijî dewleta tirk û li dijî zilma dewleta Tirkiyeyê şerê çekdarî dane destpêkirin.

Kurdan êdî guleya yekem berdabûn. Ev guleyê yekem ku berdabûn nava dilê tarîtiyê, berdabûn tirs û xofa dijmin, berdanbûn mêjiyê xwe yê razayî, berdabûn helwesta koledariyê û berdabûn dilê neyaran, piştî rojekê li hemû deşt û çiyayên Kurdistanê olan û deng vedabû. Piştî hefteyekê jî hemû cîhanê ew dengê ku li çiyayên Şemzînan û Dihê deng vedabû, dibihîzin. Guleyê yekem di dîroka kurdan de dibe destpêkek, dibe mîladek.

**Serhildan**

Çîroka PKK'ê ji axaftina yekem, civîna yekem, rêxistina yekem, guleyê yekem, koma yekem a gerîla, û ji konsera yekem, bi lez û bez kete ser riya pêşketinên mezintir. Di salên 90'î de êdî destanên mezintir lê zêde dibin...

Di salên 90'î de ku şerê qirêj ê Komara Tirkiyeyê derketibû asta herî bilind, dewletê hewil da ku serhildanên gel, bi xwîn rijandinê bitemirîne. Lewre jî bû serdemek ku herî zêde gund hatin şewitandin û valakirin, mafên mirovan hat binpêkirin, rewşenbîr, rojnameger û pêşengên kurd bûne hedefa kontrgerîla û tîmên taybet ên JITEM'ê û bû sedemeke tarî ku herî zêde di wê serdemê de li dijî gelê kurd cinayet pêk hatin.

Li dijî vê konseptê gel jî serî radike. Bi serhildanan bersivê dide bûyerên qirêj. Li Nisêbînê bi rojan gel dakete kuçe û kolanan û bi yek dengî stranên azadiyên xwendin. Li Cizîrê gel bi girseyî Newroz pîroz kir. Amedê jî xwe nîşan da û got ez jî heme û bi rojan sloganên, "PKK gel e, gel li vir e.", li kûçe û kolanên Amedê olan da...

27'ê Mijdarê, 15 Tebaxê û Rojên Newrozê, bi şehîdbûna gerîla, rewşenbîr û rojnamegerên kurd re, merasimên cenaze jî vegeriyan serhildanên bi heybet. Êdî her rojek ji bo gelê kurd bû roja serhildanê...

***SIBÊ:***
**** Jeanne D'Arca kurdan: Bêrîtan…***
**** Di nava PKK'ê jin û azadî…***
**** Komploya Navneteweyî…***
**** Manîfestoyeke nû hate nivîsandin…***

## 28 Adarê û Egîd...

***DU SAL*** bi ser teqandina guleyê yekem re derbas bibûn.
Sal 1986...
Dem 28 Adarê
Ji rojan, În
Ew roj ji şerekî mezin re avis bû... xayîn ketibûn kemînê, tiliyên kujeran li ser teqînekên çekan bû Wê rojê dîsa celad wekî vampîran li xwînê digeriyan... Wê rojê, celad, xayîn û kujerên rûreş ketibûn kemîna evîndarên azadiyê, şoreşgerên Kurdistanê û di encamê de rastî hev hatibûn...
Roj diçû ava... tarî dikete erdê... Operasyonê dest pê kiribû... li asîmanê welatê me, dengê top û tangan belav bibû... pirûskên ku ji guleyan derdiketin, asîmanê welêt ronî dikir. Û di wê şeva tarî de, di demekê de ku bêhna xwîn û barûdê tevlihev bibû, guleyeke xayîn li bedena fermandarê efsanewî û mîmarê teqandina guleyê yekem ketibû...
Belê, Egîd, ango Mahsûm Korkmaz di vê şeva xayîn de, li çiyayê Gabarê ketibû ser ser axa sar. Lê belê piştî wî, hemû zarokên ku ji dayikbûyî, bibûne Egîd... Niha li her malekê, li her goşeyekê welatê me, di nava her lîstikekê de, li her gund û li her taxeke bajarên Kurdistanê, bi dehan, sedan û bi hezaran Egîd hene.





Azîz Ogur
abdulazizogur@hotmail.com

## Zir-Nijadperest

Nijadperestiya tirk, jargona bi kar tîne û bi giştî têgihiştina wan tiştekî wisa xweser e li tevahiya cîhanê mînakên wê tune ne. Di bin her peyv û hewldanê de kompleksek heye, bawerim beşên zanistê yên mîna psîkolojî, civaknasî jî hêj tê negihiştine ku çi navî lê bikin.

Asta xwendin û paye çi dibe bila bibe, ji mirovekî ji rêzê yê kolanê bigire heta bi hiqûqnas, siyasetmedar û pisporan jargoneke wisa mîna hev tê bikar anîn mirov dibêje qey tev ji heman fabrîkayê û bi heman qalibî hatine derxistin. Dema mafên mirovan, azadî û mafên gelan û bi taybetî jî kurd dibin mijara gotinê, axaftinên şevanekî û yê profoserokî tirk peyv bi peyv mîna hev in. Qaşo Profesor, hiqûqnas, demokrat, çepgir, zanyar, rewşenbîr siyasetmedar, wezîr, serokwezîr, serokomar û hwd. dema reha tirkîtiyê gij dibe, kesayetiya wan a bi kompleks û ji 'rêzê' bi hemû rastiya xwe xwe dide der. Beyî cûbûneke biçûk mîna koroyeke di nava ahengeeke bêqisûr de şivan, gavan, cotkar, karker, çepgir, siyasetmedar, profesor, akademisyen, kesên xwendin/nivîsandina wan tune ne, tînervan, serseriyê kolanan, esnaf, hunermend, karsaz, xwendekar, ciwan di heman astê de, bi heman hevokan, bi heman hestan û bi heman kompleksê tevdigerin. Li sînemeyan encama 'muhteşem' a fîlmên ku hestên tirkîtiyê miz didin de bi deqîqeyan li çepikan xistin xisûsiyeteke vê kesayetî ye. Li welatên Ewropayê daliqandina alan a li pencere, baxçe û erebeyan jî heman tişt e. Bi gotina, 'Tirkek berdelekî cîhanê ye', 'Ez pir şa me ku ez tirk im', 'Ji tirkan pêde dostên tirkan tune ne' wisa rehet dikare were galayanê beyî çavê xwe bigire dikare cîranê xwe yê kurd, ermenî, rûm heta wê rojê bi dehan caran nanê wî xwariye lînç bike, qetil bike. Lewma bav û kalên kurdan jî ev xisûsiyet bi gotina, 'nanê tirkan li ser kaba wa ye' bal kişandine ser nijadperestî, çanda lînç û bêbextiyê.

Car caran jî mirov ji mînakên trajîkomîk yên vê têgihiştinê re şahîdiyê dike. Mînak: Dema filmê 'Newala Guran -Iraq' kete vîzyonê, TV'yên tirk li ber deriyê sînemeyan ji kesên di destpêkê de film temaşe dikirin der barê fîlmî de pirs dikirin. Mirovên ku egoya wan û damarê wan ê tirkîtiyê heta noqteya dawî bi 'qehremanê tirk Polat Alemdar' re gij bûbû bi şêweyekî ku ji xwe çûyî ji salonê derdiketin. Tevan digot 'Ev fîlm rastiya me tirkan nîşanî cîhanê tevan dide'. Ciwanek ku mîkrofon nêzî wî bû li ser pirsa 'fîlm çawa bû' bi rengekî matmayî/şokbûyî diaxivî ev bersiv dida nûçegan: 'Birê min mîn dît ka em tirk çawa ne! Em çawa mezin û bihêz in. Fêm nakim çima em li ber lingê ewropiyan digerin dibêjin me bixin Yekîtiya Ewropa. Em ji Ewropayê mezintir in.'

Lewma sedemên dîrokî û psîkolojîk a lînçkirina kurdan yên kûr hene û divê her kes bizanibe ku dema mijar bûn kurd, azadî û mafê mirovan ti cûdabûna mirovên pêr li Îzmîrê, duh li navçeya Bayramîç Çanakaleyê ku êrîşî kurdên kirin xwestin wan lînç bikin û Serokwezîr Erdogan, Wezîr Cemîl Çîçek û yên mîna wan tune ye. Ji heman têgihiştinê tên, çiqûlê heman pinî ne. Paye, statuya wan çi dibe bila be, asta xwendina wan çi dibe bila be nasnaya wan a bingehin 'tirk' a çêker û şovenîst e ku li serê gelan bûye bela.

***

31'emîn Salvegera PKK'ê Roja Vejînê li tevahiya gelê kurd û mirovahiyê pîroz be.

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL
**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91 **Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
**Yaygın Süreli Yayındır**

# Êrîşên li dijî kurdan zêde bûn

**Dema deshilatdariya AKP'ê li bajarên tirkan êrîşên lincê yên li hemberî kurdan zêde bûn. Di nava 4 salên dawî de li hemberî kurdan 39 bûyerên lincê pêk hatin. Herî dawî li navçeya Bayramîça Çanakkaleyê nijadperestan êrîşî kurdan kir**

NAVENDA NÛÇEYAN / AMED

Êrişa lîncê ya li dijî kurdan li bajarê qaşo hemdem a Îzmîra Tirkiyeyê pêk hat. Di nav 4 salên dawî de bi zêrandin û gijkirina AKP, CHP û MHP'ê bi kêmanî 39 êrîşên lîncê li dij kurdan pêk hatiye.

Ji hikûmetê heta qaşo 'çepgirên' tirk êrîşên nijadperestên tirk ên Îzmîrê yên li dijî kurdan wek hesasyeta gel destnîşan kirin. Lê di van êrîşên wisan de nijadperestên tirk qesta can, mal, wesayît, cihên kar yê kurdan dikin û hewl didin ku wan ji cih û warên wan bikin.

Piştî êrîşa faşistî û nijadperestên Îzmîrê ya li dijî kurdan Serokwezîrê Tirk Erdogan û payedarên din ên hikûmetê êrîşkaran pîr û pak nîşandan û sûc kirin stûyê DTP'ê. Ligel şerê giran û berfireh ê li Kurdistanê dîmenên wisa li rû nedaye. Lê di dema desthilatiya hikûmeta AKP'ê de li bajarên tirkan êrîşên lîncê ya li dijî kurdan rû dan û zêde debe. Erdoganê ku DTP'ê sûcdar dike di sala 2008'an de jî kesê bi çeka bi pompe êrîşi kurdan kiribû parastibû. Erdogan ji bo wê êrîşkarî digot 'welatî mafê xwe yê mudaxeleyê bikar aniye.'

Di sala 2005'an de jî li navçeya Bozuyuk a Bursayê kurd rastî lîncê hatin û bi sedan birîndar bûn. Wezîdê Dadê yê demê Cemîl Çîçek vê êrişê wek mafê bertekê yê welatiyan destnîşan kir. Par di sedana DTP'ê ya Hatayê de şaredarê bajêr dirûşma nijadperest ya 'an hez bike an bicehime' li ser bîlbortan daliqand. Lê ne hikûmet û ne jî dadgehê ji bo vê tiştek got. Piştî bajarên êrişkar ên wek Bursa, Sakaryayê li Îzmîrê jî propagandaya bi kurdan re dan û satandinên bazirganiyê nekin bilind dibe.

Encama êrîşên lîncê ku bi ji aliyê payedarên hikûmetê ve tê zêdandin derketiya asteke pir bi fikar. Di nav 4 salên dawî de hejmara êrîşên lîncê ku haya rayagiştî jê çêbûye 39'in.

**Êrîş bi organîze ne**

Êrîşên li dijî kurdan hemû bi awayeke plankirî pêk hatine. Di nav 4 salên dawî de êrîşên lîncê ku bi zêrandin û gijkirina hikûmeta AKP'ê, CHP û MHP'ê pêk haine ev in:

✓ Li Trabzonê roja 6'ê nîsana 2005'an de li dijî TAYAD'ê êrîşa lînçê pêk hat.

✓ Di 10'ê nîsana 2005'an de piştî 4 endamên TAYAD'ê hatin girtin TAYAD'ên ku xwestin daxuyaniyê bidin careke din rastî lîncê hatin.

✓ Di 12'ê nîsana 2005'an de li Sakaryayê 5 endamên TAYAD'ê ku ji bo ku van bûyeran protesto bikin xwestin balavok belav bikin lê bi sedan kes êrişî wan kirin.

✓ Di 21'ê tebaxa 2005'an de li navçeya Seferîhîsara Îzmîrê 5 ciwanên kurd bi boneya endamên PKK'ê ne xwestin lînç bikin.

✓ Di 6'ê îlona 2005'an de wesayîtên ku xwestin biçin mîtînga Gemlîkê û hikûmet destûr neda li Bozuyuka Bursayê rastî êrîşên fişîstan hatin.

✓ Di 10'ê catmeha 2005'an de 15 endamên ESP'ê ku xwestin li Kayseriyê daxuyaniya çapemeniyê li dar bixin lê rastî êrîşa faşîstan hatin.

✓ Roja 2'ê mijdara 2005'an de endamên TAYAD'ê li Rîzeyê rastî êrîşê hatin.

✓ Roja 12'ê Kanuna 2005'an de 4 endamên Federasyona Gelên Esasî dema li Samsunê belavok belav dikir rastî lînçê hatin.

✓ Roja 31'ê kanuna 2005'an 2 endamên TAYAD'ê dema li Artvînê belavok belav dikir hinekan ew dan ber daran.

✓ Roja 25'ê sibata 2006'an li Îzmîtê faşîstan bi hinceta ku ciwanek ala tirk daye ber pehînan girseyê hewl da ku ew lînç bikin.

✓ Roja 31'ê adara 2006'an li Sakaryayê bo ku 9 ciwanên zanîngeha Sakaryayê li cadeya Çarkê afîşên têkildarî Mahîr Çayan darve dikir 2 hezar kes êrişî wan kir.

✓ Roja 8'ê nîsana 2006'an li Erzîncanê çalekvanên ku di çalekiya rûniştinê de bû rastî êrîşa faşîstan hatin û hat westin ew bên lînç kirin.

✓ Roja 8'ê nîsana 2006'an de ciwanên ku xwestin li Ispartayê belavok belav bikin bi boneya ku PKK'î ne rastî lînçê hatin.

✓ Roja 12'ê gulana 2006'an de endamên TAYAD'ên da Mersînê dema belavok belav dikir faşîstan êrişî wan kir.

✓ Roja 21'ê gulana 2006'an li Kemalpaşaya Îzmîrê êrişê kurdan kirin. Di vê êrişê de Serokê Duyemîn ê Ulku Ocakan hat kuştin. Li ser vê kurdên navçeyê bi giştî bû hedefa faşîstên tirk ên navteyê. Li ser vê derdora 100 kurd cih û warên xwe hiştin û ji navçeyê revîn.

✓ Endamên Federasyona Komaleyên Azadî û Mafên Esasî dem li gundê Kiyi ya Kirklareliyê kampê de bû roja 20'ê tirmeha 2006'an rastê êrîş alîncê hatin.

✓ Roja 22'ê tebaxa 2006'an de ciwanê ku ji bo sinavê çûbû Tokatê bo ku PKK'î ye rastê êrişê hat.

✓ Roja 29'ê tebaxa 2006'a karkerên kurd ên înşaatê li gundê Bozkir a Konyayê rastî lînçê hatin. Yek ji wan di deqa dawî de ji lînçê hat rizgarkirin û 25 karker jî navçeyê derketin.

✓ Roja 30'ê tebaxa 2006'an de li Stenbolê di pîrozbahiya 30'ê tebaxê de 4 ciwan rastî êrîşê hatin.

✓ Roja 7'ê îlona 2006'an li Akyaziya Sakaryayê karkerên findiqan li baxçekî çayxaneyê rûdinişt û MHP'î yan êrîş bir ser wan.

✓ Roja 5'ê hezîrana 2007'an de du ciwanên Amedî bo ku tîşortên Ahmet Kaya li xwe kirin û rojnameya Ozgur Gundem xwendin rasî lînça 500 MHP'îyên nijadperest hatin.

✓ Roja 26'ê kanûna 2007'an li Adapazarê 20 kes hatin binçavkirin. Dema polîs ev 20 kes ji bo kontrola tenduristiyê dibir nexweşxaneya Erenlerê ev kes bi êrişê re rû bi rû man.

✓ Roja 8'ê çileya 2008'an de li Zanîngeha Kocatepeya Afyonê 2 xwendekarê kurd 5 seat rastî îşkenceya faşîstan hat.

✓ Roja 27'ê nîsana 2008'an DTP'î li şahiya aştî û biratiyê de rastî êrîşa ulkucuyan hat û Ebubekîr Kalkan (65) ji qeyaran dil jiyana xwe ji dest da.

✓ Roja 15'ê hezîrana 2008'an li navçeya Gebzeya Kocaeliyê 12 kurt li ser angaşta bi gotin jinek aciz kirine rastê linçê hatin.

✓ Roja 3'yê îlona 2008'an li bajaroka Tepekoya Mersînê Tepeköy Beldesi'nde 1500 karkerên ku pirtirên wan jin û zarok ku çûbûn xoxan berhev bikin rastî êrişa welatiyên bajarokê hatin.

✓ Roja 1'ê cotmeha 2008'an li bajaroka Altinovya Balikesîrê ji ber nîqaşên devkî yê ciwanan alozî dom kir 2 kest hatin kuştin. Piştî vê di navçeyêde li dijî kurdan êriş dest pê kirin.

✓ Roja 2'yê cotmeha 2008'an de bi heman hincetê li bajaroka Altinovaya Ayvaliga Balikesîrê li dijî kurdan heman êriş dom kir û malek dan ber agir û wesayîtan dan ber keviran.

✓ Roja 9'ê cotmehê 2008'an li bajaroka Karaçulha ya navçeya Fethiye ya Muglayê ji ber pevçûna ciwanan êriş pêk hatin.

✓ Roja 6'ê mijadara 2008'an de li taxa Hidirliya Edeneyê Tekîn Erdîk (18) bo ku motorsiklet diçî û ji aliyê 3 ciwanên kurd ve hat kuştin. Kurd bi giştî rastî êrişê hatin.

✓ Meha gulana 2009'an de li navçeya Akyaziya Sakaryayê bi bi rojan alozî dom kir. Piştî vê aloziyê roja 19'ê gulanê êrişê karkerên findiqan kirin û kurdek hat kuştin û 2 kurd jî bi giranî birîndar bûn.

✓ Roja 15'ê cotmeha 2009'an li navçeya Arîfiyeya Sakaryayê ji ber ku Halîs Çelîk di telefonê de bi kurdî peyiviye rastî êrîşê hat.

✓ Roja 25'ê cotmeha 2009'an 150 ulkucu hatin ber DTP'an bajarê Konyayê cam û deriyên avahiyê şikandin.

✓ Roja 26'ê cotmeha 2009'an li bajaroka Karpuzluya Edîrneyê Umît Baran û 2 birayên xwe li bazarê ji ber ku di telefona wan de newaya kurdî wek zîlê lê dide rastê êrîşê tên.

✓ Roja 13'e mijadar 2009'an de li Hayraboluya Tekîrdagê ji ber ku du kesan di nav xwe de kurdî peyivîne kurd rastî êrişê hatin û 2 kes bi giranî bigiştî 6 kes birîndar bûn. Karkeran bo ku ewlehiya canê wan nemaye ji navçeyê derketin.

✓ Roja 17'ê mijdara 2009'an de ciwanê bi navê Alî Canan li Zanîngeha Kocatepe ya Afyonê rastî êrîşa nijadperestan hat.

✓ Roja 24'ê mijdara 2009'an faşîstên neteweperest ên Îzmîrê êrîş birin ser konvoya DTP'ê û 20 kes birîndar bûn.

✓ Roja 26'ê mijdara 2009'an li navçeya Bayramîça Çanakkaleyê 2 û 500 kesan êrîş birin ser kurdan û xwestin ew lînc bikin.

## Li Bayramîçê êrîşî kurdan kirin

***LI BAJAROKA*** Bayramîça Çanakkaleyê nijadperestan êrîşî kurdan kir. Gefa, "Ji malan dernekevin" li kurdan hatin kirin.

Li gorî agahiyan li taxa Bajar oka Bayramîça Çanakkaleyê li ber otogarê pevçûnek derket. Hate daxuyandin ku 4 ciwanên kurd jî xwestin berevahiyê bikin û li ser vê yekê bi polîsan re nîqaş kirine. Hate destnîşankirin ku di encama nîqaşê de polîsan li Tamer Demîr, Tîmur Ozkan, Ceyhun Gormuş û Mehmet Bajaran xistiye. Lêdana polîsan di demek kin de bi beşdariya kesên li derdorê vegeriya lînca 4 ciwanên kurd. Ciwanên kurd pêşiyê li nava taxê û piştre jî dema dibirîn qereqolê rastî heman lêdanê hatine.

Zêdeyî hezar êrîşkarên bi polîsan re li zarokan xist, li ber qereqola polîsan bi sloanên ,"Gelê Bayramîçê were vir, kurdan derxe ji derve, şehîd namirin", "Em ê vir ji kurdan re bikin goristan" û "Em nahêlin hûn li vir bijîn" avêtin.

Êrîşkarên gefên kuştinê li kurdan xwarin, tekbîr anîn û li taxên kurd lê dijîn cemên malan şikandin. Di dema êrîşê de ji taxê dengê çekan hat.

Ji kesên mala wî rastî êrîşê hatî Taner Demîr, diyar kir ku tiliya polîsan di nav bûyerên li bajarokê pêk hatîn de heye û wiha got: "Polîs wekî tu tiştek çênebûye tevdigeriyan. Polîsan li hemberî êrîşakaran tiştek nekirin. Li malan geriyan û ji kurdan re gotin dernekevin ji derve. Em ji ewlehiya canê xwe bifikar in." Demîr diyar kir ku berî niha jî bûyerên bi vî awayî pêk hatine û 3 meh berî niha cardin rastî êrîşê hatine.

**Rastî îşkenceyê hatin**

Taner Demîr diyar kir ku piştî biraziyê wi Tamer Demîr hatiye binçavkirin li Miduriyeta Polîsan rastî îşkenceyekî dijwar hatiye û xwest ku rayagişti bihestiyar be. Demîr, wiha got: "Ez çûme Miduriyeta Polîsan. Tu kes pê re eleqedar nabe. Ez nizanim birine nexweşxaneyê an na. Bi awayekî rast me hevdîtin nekir." Demîr, destnişan kir ku bi parlamenterên DTP'ê re hevdîtine kirine û xwest ku hemû kes bihestiyar be. **ÇANEKKALE**



## Komên Aştiyê gera xwe didomîne

Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê, ger û geşta xwe ya bi gel û saziyên sivîl re didomînin. Endamên komên aştiyê di çarçoveya ziyaretan de li navçeya Westan a Wanê xîtabî gel kirin û li Amedê jî Odeya Endezyarên Elektirîkê ziyaret kirin.

Endamên Koma Çareseriya Demokratîk û Aştî ku bi bangewaziya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatine, li navçeya Westanê ya Wanê bi gel re hatin ba hev. Endamên koman Gulbahar Çîçekçî, Hamiyet Dînçer Mexmûrê Nurettîn Turgut û Nîzar Buldan, di çarçoveya ziyaretên gel de çûn navçeya Westanê. Komên Aştiyê li avahiya DTP'a navçeyê ji aliyê gel ve rastî eleqeyek mezin hatin. Di hevdîtinê de Endama Koma Aştiyê Gulbahar Çîçekçî, diyar kir ku ew ji bo pêşiya aştiyê vekin hatine. Çîçekçî, da zanîn ku ji 19 cotmehê heta niha gelek tişt hatin guhertin û destnîşan kir ku cara yekem e Tirkiye ewqas nêzîkî aştiyê dibe. Çîçekçî, anî ziman ku hatina wan ji hêla nijatperestên wekê MHP û CHP'ê ve dixwazin bê provokekirin. Çîçekçî, derbirî ku sedema vê yekê jî ji ber têrnekirina siyaseta AKP'ê ye û wiha axivî: "Qala vekirina demokratîk dikin. Lê Birêz Ocalan ji odeya 13 metrekareyî derxistin û xistin odeyek 6 metrekareyî. Ev yek nayê pejirandin. Li şûna şert û mercên Brêz Ocalan baş bikin, xirabtir kirin." Piştre Endama Koma Aştiyê yê Mexmurê Nîzar Buldan jî, got ku bi salan e îşkence, pêkûtiyên cur bi cur, zilum û kuştina li dijî gelê kurd rewa tê dîtin û vê yekê hîn didomînin.

Endamên komê piştî civîna gel saziyên sivîl ziyaret kirin. Komê, di ziyaretê de Komeleya Karsazên Ciwan a Wanê (VANGİAD) ziyaret kir. Di ziyareta VANGÎAD'ê de Serokê komeleyê Kadrî Salaz pênûs diyarî endamê komê kirin. Koma Aştiyê, piştre Yekîtiya Dermanfiroş (Eczacılar) ên Tirk ziyaret kir. Endamên Koma Aştiyê li vir jî armanca hatina xwe vegotin û diyar kirin ku ew amadene beşdarî xebatên Meclîsa Aştiyê bibin.

**Divê mafê kurdan bê dayîn**

Li Amedê jî endamên koma aştiyê çûn serdana saziyan. Endamên komê li TMMOB'ê ji aliyê Sekreterê Bajêr yê TMMOB'ê Îdrîs Ekmen ve hate pêşwazîkirin. Ekmen, di pêşwazîkirinê de axivî û diyar kir ku aştî tenê bi çekberdanê pêk nayê û xwest mafê gelê kurd jî wekî mafê hemû gelê cîhanê bê dayîn û ji aliyê qanûnan ve bê parastin.

Berdevê Koma Aştiyê ya Qendîlê Mehmet Şerîf Gençdal jî sedema hatina xwe ya Tirkiyeyê vegot. Gençdal, destnîşan kir ku ji bo aştiyek mayinde divê berî her tiştî operasyon bi dawî bibin û wiha got: "Rêberê Gelê Kurd Brêz Ocalan ji sala 1993'an de agirbestê îlan dike. Lê hemû hewildanên agirbestê bêbehrsîv dimîne. Em bawer dikin ku aştî lê li ser vê axê aj bide. Ger ku operasyon bidomin, gerîlla jî dê neçar bimînin ku xwe biparêzin. Ger ku wisa bibe jî dê bi avayekî xwezayî kuştin bidomin."

Gençdal, bal kişand ser şertên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan jî û got ku Ocalan 9 salan di bin tecrîda giran de ma. Dixwazin li ber çavê CPT'ê bêjin me şert û mercên Ocalan baş kirin. Lê mixabin mercên Brêz Ocalan ji berê xirabtir bûye. **AMED / WAN (DÎHA)**

## Hevalê me hate tehdîtkirin

Li navçeya Bazîdê ya Agirî xebatkarê rojnameya Gunluk û rojnameya me Rojevê Ufuk Demîr, ji aliyê polîsên sivîl ve rastî gefên kuştinê hat.

Li navçeya Bazîdê ya Agirî hevalê me Ufuk Demîr, diyar kir ku di 10 rojên dawî de polîsên sivîl wî dişopînin. Demîr, da zanîn ku polîs piştî şopandina wî bi nûmareyên veşarî li wî digerin û gefên kuştinê li wî dixwin. Demîr, got ku ewlehiya wî tune û dê serî li dozgeriyê bide. Demîr, da zanîn ku tiştek bi serê wê de bê berpirsiyar polîsên ku wî dişopînin. **AGIRÎ**

www.arsivakurd.org

## Pîrozbahî

Ji ber şer û pevçûnên ku bi salane li vî welatî berdewam dike me gelek cejn bi hêsirên çavan û bi kul û derd derbas kirin. Bi hêviya ku ev cejna Qurbanê û cejna 27'ê Mijdarê ya damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê bibe wesîleya çareseriya pirsa kurd a aştiyeke bi rûmet. Bi vê hêviya aştî û wekheviyê em salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê û cejna Qurbanê li gelê xwe yê GEVERê û li hemû kurdan pîroz dikin

**Baskê Jinan, Baskê Ciwanan (YDGM)**
**DTP'a GEVERÊ**

## Pîrozbahî

Bi taybetî cejna gelê me yê Misircê û bi giştî tevaya misilmanan bi dil û can pîroz dikim û hêvî dikim ku bibe wesîleya aştî, biratî û azadiyê.
*Cejna we ya Qurbanê Pîroz be*

**Şaredarê Hezoyê M Raşît Haşîmî**
**û Endamên Meclisa Şaredariyê**

## Pîrozbahî

Bi hêviya tunebûna xeydanî, neyartî û kedxwariyê cejna hemû gelan bi hestên germ pîroz dikim û ji hemû gelên cîhanê re aştî û azadiyê dixwazim

**Şaredarê Misircê**
**Necat Yilmaz û**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## Pîrozbahî

Rik û kerb mirinê bi xwe re tîne. Lê rikbadana ji bo aştî û biratiyê jiyanê bi xwe re tîne. Bi hestên hêvîdar ji bo aştî û biratiyê cejna we pîroz dikin

**Şaredara Bazîdê Dr Canan**
**Korkmaz û Endamên Meclîsa**
**Şaredariyê**

## Pîrozbahî

*Cejna we pîroz be…*
Cejna gelan pîroz be û ev cejna pîroz ji mirovahiyê re jiyanek aramî, wekhêvî û rûmetiyê bîne

**Serdar Înşaat /Amed**

## Pîrozbahî

Daxwaz û hêviya me ev e ku Cejna Qurbanê bibe bingeha avakirina yekîtiya gelê me

**Çeysa Înşaat Mehmet Çelîk**
**Amed**

## Pîrozbahî

Em hêvî dikin ku cejna Qurbanê bibe sedem da ku mazlûm yekîtiya xwe biafirînin, hêza xwe bikin yek û têkoşîna azadî, aştî û demokrasiyê baştir berz bike. Bi vê bîr û baweriyê em cejna Qurbanê li gelê xwe û hemû alema îslamê pîroz û bimbarek dikin

**Kelvan Beton / Amed**

## Pîrozbahî

Hemû aliyên ku di nava şer û pevçûnan de ne di rojên wiha pîroz de li riyên careserî û aramiyê digerin. Bi hêviya rojên xweş û aştiyê cejna Qurbanê li hemû gelê me pîroz be

Yenişehir LTD. ŞTİ. PEYZAJ ve KENT MOBİLYALARI
YENİŞEHİR LTD. ŞTİ. Alipınar Mah. Sezai Karakoç Bulvarı

**Yenîşehîr Kent Mobîlyalari**
**Saziya Şaredariya**
**Yenîşehîrê ye**

## Pîrozbahî

Em cejna mirovahiyê pîroz dikin. Di dîroka gelan de rojên ji bo xweşiyê, qenciyê, biratiyê û tevkariyê dibin sembol hene. Ev roj di heman demê de ev in ku hezkirin, dostanî û hêviyan dibişkivînin. Bi hêviyên bilind û hestên alîkarîxwaz em hêvî dikin ku Cejna Qurbanê ji bo gelê me azadiyê bi xwe re bîne. Bi hêviyên cejnên xweştirîn bi hestên dîlanê em cejna we pîroz dikin

**Endamên Meclîsa Giştî**
**ya Bajarê Amedê**

www.arsivakurdi.org

# Dewlet bi tecrîdê bersivê dide

**Gelê kurd coş û dildariya xwe ya ji bo çareseriyeke demokratîk û aştiyane anî ziman. Ji bo pêkhatina aştiyeke mayinde li her derê daket kolanan. Lê dewleta tirk bi tecrîda giran a li ser Rebêrê Gelê Kurd Ocalan û êrîşên nijadperestan bersivê dide**

NAVENDA NÛÇEYAN / AMED

Dewleta tirk careke din bi zext û zordariyan peyama cejnê da gelê kurd. Gelê kurd ku cejna Qurbanê û 31'emîn salvegera damezrandina PKK bi hev re pîroz dike, li hemberî zext û zordariyên dewletê nerazîbûna xwe di asta herî bilind de tîne ziman.

Bêtehamûliya dewleta tirk a li hemberî şanazî û kêfxweşiya gelê kurd bi pêkanîn tecrîd û êrîşên nijadperest bersiv da. Li ser navê sererastkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li girtîgeha Îmraliyê tecrîd hate girankirin. Hucreya ku Ocalan tê de tê hiştin hate guhertin û ew neqilkirin hucreyek 6 metrekareyî. Ocalan ku berê di hucreyeke 12 metrekareyî di hate hiştin li hemberî vê pêkanînê, bi westeya parêzerên xwe ragihand ku şert û mercên wî hatine girankirin.

Dema gelê kurd nerazîbûna xwe ya ji bo vê yekê dianî ziman; li Wanê dadgehê biryara berhevkirinê ji bo parêznameyên Ocalan da.




**Serokwezîrî hedef nîşan da**

Roja ku biryara berhevkirinê ji bo parêznameyên Ocalan hatiye dayîn li Îmzîrê nîjadperestan êrîşî konvoya DTP'ê kir. Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan li êrîşkaran xwedî derket û got ku 'ev yek hesasiteya welatiyan nîşan dide'. Cîgirê Erdogan, Cemîl Çîçek jî DTP hedef nîşan da û vê carê jî bal kişand ser doza ji bo girtina DTP'ê di rojeva Dadgeha Makeqanûnê de ye.

Li hemberî van pêkanînan gelê kurd lêxwedîderketina xwe ya ji bo Ocalan berz kir û li aliyekî nameyên ji bo pîrozbahiya cejnê rêdikin li aliyê din li kolanê çalakiyên ji bo protestokirina tecrîdê li dar dixe.

**Li Amedê nerazîbûn**

DTP'ê ya Amedê, bi armanca balkişandina mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan meşek pêk anî. Ligel Parlamenterê DTP'ê yê Amedê Selahattin Demirtaş, Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr Şaredarên Navçeyên Navendî û endam û rêveberên DTP'ê jî di navde bi hezaran kes li ber avahiya DTP'ê civiyan. Girseye li ber stran û srûdan govend gerandin û piştre bi awayekî leşkerî dest bi meşê kirin. Girsa li ber avahiya DTP'ê civiyan ji bo aştiyê kevok firandin û bi pankartên "An bi RêberApo re jiyanek azad, an jî tolhildan", "Gelê kurd di 6 metrekareyan de hilnayê", "Azadiya te azadiya me ye, Nexşeriya te rêca me, parasnameya te perspektîfa me ye" û "Hezar slav ji Rêberê Apo yê ku 27'ê Mijdarê afirandiye re" vekirin.

**'Mercên Ocalan girantir bûn'**

Serokê DTP'ê ya Amedê Firat Anli li ber Parka Koşuyoluyê li ser navê girseyê daxuyaniyek da çapemeniyê. Anli, diyar kir ku di pêvajoya hewldanên demokratîk û çareseriya pirsgirêka kurd dihat niqaşkirin û heviyên kurdan zêdetir bû de şert û mercên Ocalan hîn girantir bûn. Anli, polîtîkayên AKP'ê rexne kir û anî ziman ku AKP gavekê pêşde 2 gavan bi paşve davêje. Anli, destnîşan kir ku ew li hemberî vê polîtîka û nêzîkatiya li dijî Ocalan bêdeng namînîn û wiha got: "Heta ku şert mercên birêz Ocalan baş nebin, heta ku nexşerê û parasnameyên birêz Ocalan neyên dayîn pirsgirêk çareser nabe. Divê van daxwazên gel pêk werin." Anli, desteserkirina bi desteserkirina parêznameyên Ocalan rewşa 12'ê îlonê dîsa zindî bûye. Anli di dewema gotinên xwe de anî ziman ku îradeya gelê kurd di 6 metrekareyan de hilnayê.

**Li Wanê meşa girseyî**

DTP'a Wanê jî bi armanca balkişandina ser mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û daxwaza aşkerekirina nexşerê, meşek girseyî pêk anî û tecrîda li dijî Ocalan şermezar kir. DTP'a Wanê, bi armanca balkişandina ser mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, meşek girseyî pêk anî. Di meşê de endam û rêveberên DTP'ê, Şaredara Bajaroka Sixkeyê jî di navde bi hezaran kes amade bûn. Rêveberê DTP'ê ya Wanê Rafet Taş li vir axaftinek kir û bal kişand ser girankirina tecrîda li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan. Taş, anî ziman ku bi vê plana xapandinê ku bi destê AKP'ê tê meşandin, bi êrîşên tecrîdê re hate deşifre kirin û asta çewtiya wê datîne ber çavan. Taş, wiha axivî: "Nêzikatiya pergalê ya li dijî Birêz Ocalan ku gelê kurd bi hesas dişopîne, pêvajoyê tevlihev dike. Derket holê ku li şûna şert û mercên birêz Ocalan baş bikin, şert û mercên Ocalan girantir kirine. Em vê yekê qebûl nakin û şermezar dikin."

# Li Îzmîrê nerazîbûna li dijî Erdogan û Çîçek

Hewldana Koordînasyona Çareseriyekî Demokratîk, Tirkiyeykî Demokratîk a Îzmîrê, bertek nîşanî daxuyaniyên Serokwezîr Erdogan û Alîkarê Serokwezîr Cemîl Çîçek yên têkîldarî êrîşa li dijî DTP'ê ya li Îzmîrê pêk hatî de, dan. Hewildana Koordînasyonê xwest ku Erdogan, Çîçek, Waliylê Îzmîr û Midurê Polîsan ê Îzmîrê lêborîna xwe bixwazin.

Hewldana Koordînasyona Çareseriyekî Demokratîk, Tirkiyeykî Demokratîk a Îzmîrê, têkîldarî daxuyaniyên Serokwezîr R. Tayyîp Erdogan û Alîkarê Serokwezîr Cemîl Çîçek yên piştî êrîşa li dijî konvoya DTP'ê ya Îzmîrê pêk hatî, dayîn, şermezar kirin. Hewildanê li Şaxa ÎHD'ê ya Îzmîrê daxuyanî da çapemeniyê. Di çivînê de DTP, BDP, SEH, SDP, EMEP, DDÎP, ESP, ÎHD, MESOP, KOZ, ODP, OSP Tevgera Eleviyan ya Demokratîk û Azad û nûnerên Komeleya Piştgirî û Dostaniyê ya Çandê ya Suryaniyan jî amadebûn. Li ser navê komê Endama Komeleya Piştgirî û Dostaniyê ya Çandê ya Suryaniyan Zeynep Tozduman, daxuyanî xwend. Tozduman, diyar kir ku bi salane di vî welatî de bi destê AKP, MHP û CHP'ê ximên faşîzmê tên avêtin.

**'Cemîl Çîçek gefan dike'**

Tozduman, ani ziman ku Serokwezîr Erdogan û Alîkarê Serokwezîr Cemîl Çîçek faşîstên li Îzmîrê êrîş li konvoya DTP'ê kirin parastine û wiha got: "Dema ku di dewletêkê de wezîrek raba êrîşa li hemberî gel hatî şermizar neke û kesên êrîkar biparêze tenê wateyek wê heye. Ev yek jî ew ku hajî van êrîşan heye. Cihê wezîr rabe gel rawestîne, alê DTP'ê bi awayekî din nîşan daye. Helwestên DTP"ê yê ji bo demokrasiyê û aştiyê wekî gefekî li hemberî DTP'ê bikar aniye û sedam girtinê nîşan daye. Wezîr bi vê yekê tenê gel kurd ne hemû hêzên demokrat jî bi awayekî xirab bandor kiriye. Dewlata gavên çareseriyê dana ye hol, êrîşa li hemberî kurdan şermezar bike, cihê wê faşîst parastine û ev yek wekî berteka gel nişan daye." Tozduman, destnişan kir ku di serî de Serokwezîr Erdogan, Cemîl Çîçek, Waliyê Îzmîr, Midurê Polîsan yê Îzmîrê,CHP û MHP sûcdarin û wiha domand: "Divê ev derkevin ber gel û ji ber êrîşê lêborîna xwe bikin." **ÎZMÎR**



# Berî cejnê gul danîn ser goran

Li Geverê berî serdanên cejnê yên girseyî gule danîn ser gorê PKK'yiyan. Sadullah Duzen ku çû serdana gora kurê xwe, rastî gelek gule û qaldikên guleyan hat. Duzen anî ziman ku tehamûlî gorên zarokên wan nayê kirin û wiha got: "Peyam hatiye girtin. Bersiva me jî ew e ku heta mirinê em dê li dû şopa zarokên xwe bin."

Kes an jî kesên nasnameya wan nayê zanîn, gelek gule û qaldikên guleyan danîn ser gora endamên PKK'ê yên li Goristana Bajêrgehê. Berî serdanên girseyî yên cejnê danîna guleyan a li ser gorên PKK'yiyan bû sedema nerazîbûnan. Malbatên gorên zarokên wan li van goristanan e daxuyandin, tehamûlî miriyên wan jî nayê kirin û nerazîbûn nîşanî bûyerê dan. Malbatan daxuyandin ku peyama mirinê dayîne lê bersiva wan şopandina riya zarokên wan e.

Sadullah Duzen ku gora kurê xwe ziyaret kir, da zanîn ku hind derdor tehamûl nakin ku gel goran bi girseyî ziyaret bike. Duzen wiha axivî: "Li tu deverên cîhanê gelek xwedî li cenazeyên xwe dernekeve, tune ye. Lê feraseta tehamûlî jiyana za rokên me nekirî, tehamûlî mirina wan jî nake. Hêzên tarî bi vî awayî peyamê didin me. Peyama me hatiye girtin. Bersiva me jî ew e ku heta mirinê em di şopa zaroka xwe de ne. Ev dizanin ku gelê kurd li hemberî kîjan noqteyan hassas e. Em jî dê her tim li cem zarokên xwe bin û bila ges ji vê gulan nebe."

Endama Înîsiyatîfa Dayîkên Aştiyê ya Geverê Naciye Îke ku 2 zarokên wê li goristanê hatine veşartin, anî ziman ku kes nikare wan bi gefan ji riya wan dûr bixe. Îke wiha axivî: "Yên bi guleyan peyaman didin me, bila bizanibin ku nagihin armanca xwe. Em dê li şûna guleyan gulan danên ser wan goran. Bila ji zarokên me yên di gorê de netirsin."

Nûnerê MEYA-DER'ê yê Geverê Omer Çakir jî bi tundî bûyer şermezar kir û anî ziman ku dê goran bi girseyî ziyaret bikin. **COLEMÊRG (DÎHA)**



# Bûyera binçavkirina Lîceyê birin Meclîsê

Wekîla Seroka Komê ya DTP'ê Gultan Kişanak, welatiyên ku di sala 1994'an de li Lîceyê hatibûn windakirin û piştre agahî ji wan nehat girtin ji Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn pirsî.

Wekîla Seroka Komê ya DTP'ê Gultan Kişanak, têkildarî welatiyên di sala 1994'an de ji aliyê Fermandadariya Tugaya Boluyê ya navçeya Lîceyê ve hatibûn windakirin û piştre agahî ji wan nehat girtin bi pirsnameyekê ji Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn pirsî. Kişanak, destnîşan kir li gel hemû hewildanan tu agahî ji wan nehat girtin û wiha got: "Malbatan, ji bo definkirina kesên hestiyên wan hatin tesbîtkirin hestiyên xizmên wan xwest. Lê mixabin demek dirêj bersîv negirtin. Herî dawî Lîjneya Tipa Edlî diyar kir ku hestiyên 8 kesan di 17'ê tîrmeha 2004'an de şandine ji Dozgeriya Komarê ya Pasûrê û Midûrê Karê Nivîsê yê Edliya Pasûrê Mahîr Kizil ev li hemberî îmzeyê teslîm girtiye."

***Di pirsnameyê de ev pirs hatin kirin:***

✓ Ew hestiyên ku ku Lijneya Tipa Edlî ya Stenbolê di 21'ê tîrmeha 2004'an de ji Midûriyeta Karê Nivîsê ya Edliya Pasûrê re şandin çi lê hatin?

✓ Çima hestiyên ku bi salan e hatine tesbîtkirin nadin malbatên wan?

✓ Ligel gelek serlêdanan, çima ev 5 sal e der barê hestiyên ku radestî Edileya Pasûrê hatine kirin lêpirsîn nayê destpêkirin?

✓ Dozgeriyê der barê hestiyên 8 kesên ku li mezraya Bagcilar û Duzpelîtê hatibûn definkirin û îfadeya Ramazan Ayçiçek de lêpirsîn dest pê kiriye?

✓ Di navbera 1'ê Gulana sala 1994'an û 10 Pûşbera 1994'an de kî û çend kes li navçeya Lîceyê hatin binçavkirin? **ENQERE**

# Pîrozbahî

Cejna Qurbanê bila ji bo gelê me bibe hêvî û mizgîniya şadî û bextewariyê. Hêvî dikin ku di sala nû de li herêmê şer û pevçûn cih bidin aştî û aramiyê û gelê me bi mirada xwe ya qedîm bextewar bibe. Cejna Qurbanê li tevahiya gelê me, li Rojhilata Navîn û hemû cîhanê pîroz be

DTP

**DTP'a Amedê**

# Pîrozbahî

Bi hêviya jiyaneke azad, wekhev û aştiyeke bi rûmet ji bo çareserkirina pirsa kurd û lihevhatineke wekhev û biratî di nava hemû gelên Tirkiyeyê de. Em cejna Qurbanê di serî de li gelên vî welatî û hemû alema îslamê pîroz dikin

**Şaredarê Silopiyê Emîn Tugurlu**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# Pîrozbahî

Ji bo aştiyeke bi rûmet
Ji bo jiyaneke wekhev û azad
Ji bo çareseriyeke adil
Ji bo bidawîanîna li hêsirên dayikên vî welatî
Em bi hêvî ne ku ev cejna Qurbanê bibe wesîleya çareserkirina pirsa kurd û bi xwe re xweşî û azadiyê bîne vî welatî .
Bi van hêviyan em dibêjin: *Cejna Qurbanê li hemû gelê vî welatî û li alema îslamê pîroz be*

**Şaredarê Êlihê Nejdet Atalay**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# Pîrozbahî

Em welatekî bê şer dixwazin... Em jiyaneke bi rûmet dixwazin... Em paşerojeke bi hêvî dixwazin... Bi van hêvî û daxwazan cejna hemû gelên Rojhilata Navîn pîroz dikin

**Şaredara Wêranşarê Leyla Guven**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

www.arsivakurdi.org

## PÎROZBAHÎ

Em cejna Qurbanê ya gelê xwe pîroz dikin. Em hêvî dikin ku ev cejn aştî, aramî û azadiyê bi xwe re bîne

**Delta-tin Firat Bulvari Çelebî 10 apt 81/c Amed**

## PÎROZBAHÎ

Cejn ji bo azadî û wekheviyê hêz û şiyana gel derxe holê. Ev jî bi vê daxwazê Cejna Qurbanê li Rojhilata Navîn û alema îslamê bi taybetî jî li gelê kurd pîroz dikin

**Firat Cafe Park Orman / Amed**

## PÎROZBAHÎ

Cejna Qurbanê li tevahiya alema Îslamê, bi taybetî li gelê Melezgirtê pîroz be û ji aştî û wekheviyê re bibe wesîle. Bi vê baweriyê em cejna gelê xwe û Rojhilata Navîn pîroz dikin

**Tamara Cafe Ofîs / Amed**

## PÎROZBAHÎ

Em hêvîdar in ku hestên dilê me bibin rastî û gelê kurd bigihîje rojên azad û rojên azad cejnên hê mezintir û watedartir bike. Bi van hest û hêviyan em cejna gelê pîroz dikin

**Mehmet Tekîn / Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Her cejnek destpêkeke nû ye. Hêviya me heye ku cejn bibe bingeha demokrasî û azadiyê…

*Cejna we pîroz be*

**Rêxistina DTP'ê ya Kayapinarê**

## PÎROZBAHÎ

Ez hêvî dikim ku ev lihevhatin, di heman demê de bibe bingeha xweşbîniyê û bi xwe aştî û azadiyê re bîne.

*Cejna Qurbanê li we pîroz be*

**Avşar Otomotiv 0 (412) 415 5133 Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Em cejna Qurbanê ya Rojhilata Navîn bi daxwaza aştî û azadiyê, bi hêviya jiyaneke bi rûmet û wekhevî pîroz dikin

**Adopen Cemal Gundogdû Bismil Sanayî Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviya cejnên pêşerojê li ser axa azad di nav aştî û biratiyê de bên pîrozkirin. Em cejna we pîroz dikin

**Ozlem Gîyîm Îsmet Demîrbîlek Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Cejn bi awayê sembolîk be jî rojên geş û xweş bi bîr tînin. Em jî bi hêviyên têr û tijî ji bo her kesî siberojên geş dixwazin û cejna gelê kurd û hemû mirovahiyê dikim

**Emîn Avşar Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Cejna Qurbanê bila ji hemû gelên cîhanê re bibe wesîleya biratî, demokrasî û azadiyê. Em bi van hêviyan cejna gelan pîroz dikin

**Întekîn Înşaat Firoşgeha BOSCH'ê Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviya ku êdî şer û pevçûn bi dawî bibin em cejna Qurbanê li hemû mirovahiyê û li gelê Rojhilata Navîn pîroz dikin

**Bozanlar Gida Ali Can Bozan û birayê xwe 0412 415 04 35 Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviyên têr û tijî ji bo her kesî siberojên geş dixwazim û cejna gelê kurd û cîhanê pîroz dikin

**Rêxistina DTP'ê ya Baglarê Amed**

## PÎROZBAHÎ

Rik û kerb mirinê bi xwe re tîne. Lê rikbadana ji bo aştî û biratiyê jiyanê bi xwe re tîne. Bi hestên hêvîdar ji bo aştî û biratiyê cejna we pîroz dikin

**Şaredarê Pasûrê M. Nesîm Şimşek û Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Ji bo jiyaneke wekhev. Aştî azadî û biratî bê afirandin cejna Qurbanê li hemû Rojhilata Navîn pîroz be

**Rêxistina DTP'ê ya Yenîşehîrê Amed**

## PÎROZBAHÎ

Roşana şima pîroz keni û wazeni ke, Roşan roşnîya biratey û azadî bîyaro şaran mîyan

**Bi nameyê PÊÇAR KOMÎSYONÎ Ramazan SERÎN**

## PÎROZBAHÎ

Cejna Qurbanê li tevahiya gelê me û hemû cîhanê pîroz be. Cejna Qurbanê bila ji bo gelê me bibe hêvî û mizgîniya şadî û bextewariyê

**Kaya Demîr Dograma / Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Cejna Qurbanê ji hemû gelên cîhanê re bibe wesîleya biratî, demokrasî û azadiyê. Em bi van hêviyan cejna gelan pîroz dikin

**DaDa Cafe Kuçeya Hunerê / Amed**

www.arsivakurd.org

# Şîdeta li dijî jinan şermezar kir

**Şermezarkirinên şîdeta li hemberî jinan didome. PAJK'ê bi daxuyaniyekê şîdet şermezar kir û daxuyand ku jin bi her awayî rastî şîdetê tên**

Partiya Jinan a Azad (PAJK) bi munasebeta 25'ê Mijdarê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de şîdeta li hemberî jinan a 5 hezar salan hate şermezarkirin.

PAJK'ê di daxuyaniyê de xwest ku hemû jin li hemberî şîdetê têbikoşin. Hate daxuyandin ku şîdet û desthilatdarî beriya 5 hezar salan dest pê kiriye.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku şîdeta li hemberî jinan li hemû qadên civakê berdewam dike û şîdet ne tenê fîzîkî ye, di warê psîkolojîk, ruhî, zîhnî çandî û bi her awayê li ser jinan tê meşandin.

**Ruhê jinan teslîm digire**

PAJK'ê di daxuyaniya xwe de got ku sîstema desthilatdar ruh û bedena jinan teslim digire wiha got: "Li aliyeke, cureyeke şîdetê teşhîr dike, lê bi awayeke jî bedena jinan diforeşe û di bin navê karkeriya seksê de teşwîq dike. Lê firota bedana jinan a di bin navê azadiya zayendî û karkeriya seksê de şîdeta herî giran a kur e. weke ku wiha dibêjin. 'Ez ê di warê fîzîke de te ji mirinê rizgar bikim lê divê tu jî bi beden û ruhê xwe bibe mal û sermayeya min.' Rizgariyê vê ji vê rewşê jî divê jin ruh û bedena xwe biparêze. Ji ber ku jin ne malê kesekî din e. Heke jin bi beden û ruhê xwe bibe îrade ê xwedî nasname ancax wê demê dikare azad bibe û di vî warî de gavan bavêje."

Di daxuyaniya PAJK'ê de hate gotin ku ji bo jinan riya azadiyê nirxên demokratîk û ekolojîk a beriya 5 hezar salan bi nirxên zanistî yen roja îroyîn bên xurtkirin re derbas dibe. Ev yek jî bibe sîstemeke. Azadî ancax bi vî awayî mimkûn e.

**Gavên girîng hatin avêtin**

PAJK'ê di daxuyaniya xwe bal kişand li ser kampanyaya bi navê "em jin in, ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" ku ev salek e didome jî. Hate gotin ku kampanyayê di nava vê demê de hem di warê fikrî û hem jî rêxistinkirinê de ji bo azadiya zayendî roleke girîng lîst. Di vî warî de gavên girîng hatin avêtin. Jin bi vê tecrubeyên xwe dikarin têkoşîneke radîkal pêş bixin û azad bibin. Di berdewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Divê jin xwe ji mejiyê zilaman ên 5 hezar salan, azadiya sexte xwe rizgar bikin. Divê xwe ji wan qût bikin û amurên xwe yên felsefîk û îdiolojîk ava bikin. Azadî bi vî rengî mumkun e. Aşkera ye ku heke qûtbûna vê çanda desthilatdar nebe eşq û hezkirina rast jî pêş nakeve û nayê jiyîn jî."

PAJK'ê daxuyand ku şîdet ne tenê li hemberî jinan tê bikaranîn li hemberî civakên ku rewşa wan weke rewşa jinan e jî tê bikaranîn. Polîtikayên şîdet û pêkutiyan ên li hemberî jgelê kurd ji yên li hemberî jinan cuda nîn e. Azadiya gelê kurd bi azadiya jinan ve girêdayî ye. Azadiya jinan jî bi azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve girîdayî ye. **BEHDÎNAN (ANF)**




## Meş li dar xistin

***JINAN*** bi munasebeta 25'ê Mijdarê li Stenbol û Îzmîrê meş li dar xistin û navçeya Bismila Amedê civîn pêk anîn. Jinan bal kişand ser şîdeta li hemberî jinan.

Li Stenbolê girseyeke qerebalix li Taksîmê hatin ba hev û heta Meydana Galatasarayê meşiyan. Li vir parlamentera DTP'ê Sebahat Tuncer axivî û got ku ew ê her tim li hemserî şîdeta li dijî jinan derkevin û wiha got: "Em bawer in şîdet dê ji jiyana me derkeve. Heke em dengê xwe dernexin li Meclîsê tenê zilam biaxivin." Piştî axaftina Tuncel bi tirkî û bi kurdî daxuyanî ji aliyê Zelîha Nesanirê ve hate xwendin. Nesanir got ku li Îzmîrê li Zonguldakê jin bi kêran tên kuştin lê şîdeta zilaman hê jî weke "munferît" tê nîşandan. Nesanirê diyar kir ku şîdet ancax bi têkoşînê ji holê bê rakirin.

Li Îzmîrê endamên Platforma Jinan a Îzmîrê li ber Îskeleya Vapurê hatin cem hev. Ji vir heta postexaneya Karşiyakayê meşiyan. Jinan li vir daxuyaniyek dan. Li ser navê platformê Aycan Aytekîn daxuyanî xwend. Aytekîn got ku li Tirkiyeyê û cîhanê ji her çar jinan yek rastî şîdetê tê. Her wiha hiqûqa ku ji aliyê sîstema desthilatdar ve hatiye avakirin jî kesên ku li hemberî jinan şîdetê bi kar tîne diparêze. Aytekîn got ku ji 36 milyon jinan 18 milyon jin rastî şîdetê tên.

**Jinên kurd xwe îspat kir**

Li navçeya Bismila Amedê jî jin di koneke de hatin ba hev. Li vir Şaredara Bismilê Cemîle Emînoglu axivî û got ku jinên kur xwe bi her awayî îspat kirine.

Emînoglu wiha axivî: "Sîtema desthilatadr a zilaman dibêje 'jin pîroz in, taca serê me ne, bihuşt di bin lingê dayikan de ye' lê di jiyanê de jin nayên qebûlkirin. Birayara xwe nikarin bidin. Dema ku li malê be bavê wan, piştî ku dizewicin jî hevserên wan der barê wan de biryaran didin." Emînoglu got ku jinên kurd di nava têkoşînê de xwi bi her awayî îspat kirine.
**AMED / ÎZMÎR / STENBOL**

*Cejna we pîroz be*

Bi hêviya rojên aştî û wekheviyê, bi hêviya azadiyê em Cejna Qurbanê di serî de li gelê kurd û li hemû gelê misilman pîroz dikin. Bi hêviya ku ev cejin bibe wesîle ji bo aştî û lihevhatineke bi rûmet û li ser bingeha wekheviya di navbera gelên vî welatî de. Bi hêviya ku ev cejn bibe wesîle ji bo her kes ji aliyê xwe ve ji şer û pevçûnan re bibe asteng û rê li ber diyalog û çareseriya pirsgirêka kurd were vekirin. Bi van hêviyan em Cejna Qurbanê li hemû gelê vî welatî û alema îslamê pîroz dikin.

DTP

**Navenda Giştî ya Partiya Civaka Demokratîk DTP**

# PÎROZBAHÎ

*CEJNA WE YA QURBANÊ PÎROZ BE!*

Hêviya me ew e ku cejna Qurbanê ji bo gelê me û hemû gelên Rojhilata Navîn bibe mebesta aştî û demokrasiyê

KAYAPINAR BELEDİYESİ 1991

**Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê û**
**Xebatkarên Şaredariyê**

# PÎROZBAHÎ

Em bi baweriya ku dê çanda aştî û biratiyê li axa Mezopotamya û Rojhilata Navîn ji nû ve şîn bibe, cejna we ya Qurbanê pîroz dikin.
Em dixwazin ku Cejna Qurbanê ji gelê me re aştî, biratî û azadiyê bîne

*Ligel silav û rêzên me*

ÇINAR BELEDİYESİ 1937

**Şaredarê Çinarê Ahmet Cengîz**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# PÎROZBAHÎ

Em bi xwesteka jiyaneke azad û wekhev a li erdnîgariyeke ku *'Xezal'* bi serfirazî bibezin, Cejna Qurbanê li hemû gelê xwe pîroz dikin

*Ber bi gelek cejnên ku dê bi aştiyê bên pêşwazîkirin…*

1994 Şaredariya Baglarê

**Şaredara Baglarê Yuksel Baran**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**
**Xebatkarên şaredariyê**

# PÎROZBAHÎ

Bi hêviya ku ev roj bibe wesîleya rojên azad û aştî, jiyana biratî û wekheviyê. Bi hêviya di serî de li welatê me û li hemû Rojhilata Navîn ev xwîn were rawestandin û gelên herêmê bi biratî û wekhevî bi hev re bijîn

*Bi hêviya rojên azad û xweş em cejna Qurbanê li hemû alema îslamê û li gelê xwe pîroz dikin*

DIYARBAKIR SUR BELEDİYESİ 1994

**Abdullah Demîrbaş**
**Şaredarê Sûrê yê Diyarbekirê**
**Endamên Meclisê û Xebatkarên Şaredariyê**

www.arsivakurdi.org

## Dîwana Mele Ciwanî 'Xwenrojeka Min' derket

Dîwana Mele Ciwanî (Nûredîn Baksî) ya bi navê 'Xewnerojka Min' ji nav Weşanên Hanê derket. Wî ji ber zulm û zordariya dewletê jiyana xwe pir caran di sirgûnê de derbas kiriye û ji ber vê yekê jî gelek berhemên wî jî wenda bûn. Weşanxaneya Hanê berhemên wî yên ku hîna hatine parastin xistine nav bernameya xwe. Dîwan ji 144 rûpelan pêk tê. Di dîwanê de nivîskarê kurd Mihemed Çelîk jî li ser helbestên Mele Ciwanî nivîseke dirêj ya helsengiriyê nivîsandiye. Helbestên dîwanê bi ûslûbeke kevneşopiya helbestên klasîkî ya kurd hatine nivîsandin û wek mijar jî, bi piranî hest û ramanên welatperwerî, gotinên bav û kalan, şîret û ceribandinên çanda kurdî ya devkî û dengbêjî bi helwest û ûslûbeke xurt û jîndar hatine honandin. **AMED**

# Li Almanyayê rojên fîlmên kurdî

**Li Almanyayê Mîhrîcana Fîlmên kurdî dest pê kir û mîhrîcan dê 29'ê mijdarê bi dawî bibe. Di çarçoveya mîhrîcanê de gelek fîlmên ku di mîhrîcanan de xelat wergirtine jî dê bên nîşandan**

DOGAN UÇAR - FRANKFURT / ANF

Li bajarê Frankfurt û Ingolstadtê yên Almanyayê 4'emîn Mîhrîcana Fîlmên Kurdî dest pê kir. Di çarçoveya rojên fîlmên kurdî de li her du bajaran jî mîhrîcanê di heman rojê de dest pê bike û fîlmên ku xelat wergirtine jî bên nîşandan.

4'emîn Mîhrîcana Fîlmên Kurdî ya Frankfurtê duh dest pê kir û dê heta 29'ê mijdarê bidome. Mîhrîcana ku yekem car li bajarê Ingolstadtê bê lidarxistin dê heman rojê dest pê bike û 28'ê mijdarê bi dawî bibe. Mîhrîcana Fîlmên Kurdî ji aliyê Navenda Çanda Mezopotamyaya Frankfurtê û Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê tê organîzekirin. Mîhrîcan dê bi nîşandana fîlmê derhênerê kurd Bahman Ghobadî yê bi navê 'Kes behsa pisîkên Îranê nake' (No one knows about Persian Cats) ku di mîhrîcana Cannesê de xelat girtibû ve dest pê bike.

Di roja duyemîn ya mîhrîcanê de fîlmê Halîl Uysal ê bi navê "Fêrmiskên Ava Zê" û fîlmên "Sirta La Gal Ba - Whisper With the Wind" û "Close Up Kurdistan" bên nîşandan.

Di roja sêyemîn de fîlmên wekî "Hoppet", "Tembûr", "David und Leyla", "Ein Augenblick Freiheit", "Rê" (Yol), û roja çaremîn jî fîlmên wekî "David der Tolhildan", "Sozdar" û "Dol" bên nîşandan. Rojên fîlmên kurdî dê 29'ê mijdarê lidarxistina bernameya muzîkê bi dawî bibe.

Her wiha derhênerê fîlmê "Close Up Kurdistan" Yuksel Yavuz, derhênerê fîlmê "Ein Augenblick Freiheit" Arash Riahi û lîstikvanê fîlmê Navid Akhaven, derhênerê fîlmê "David der Tolhildan" Mano Xhalîl û derhênera belgefîlmê "Sozdar" Anne Wietsma dê beşdarî 4'emîn Mîhrîcana Fîlmên Kurdî bibin.




Mîhrîcana ku yekem car li bajarê Ingolstadtê bê lidarxistin ji aliyê Akademiya Tîgrîs û Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê ve tê organîzekirin. Di bernameya mîhrîcana ku duhê destpê kir de ji bo roja yekem fîlmên wekî "Tembûr" û "Halfmoon - Niweman" cih digirin. Fîlmên ku di çarçoveya mîhrîcanê de bên nîşandan yên din ev in; "Schatten und Wind", "Ayetên Bedenan ", "Erinnerungen an Ronahi", "David der Tolhildan", "About Ugur Kaymaz", "Çûyîn", "Reifen - Lastik", "Sozdar", "Aşinme", "Kilamek jibo Zagros", "Şin" û "Ein Augenblick Freiheit" bên nîşandan.



## Fîlmê 'Welcome' xelat wergirt

**PARLEMENTOYA** Ewropayê xelata Lux ya 2009'an da fîlmê derhêner Philippe Lioret ya bi navê 'Welcome'. Mijara fîlmê penaber in û fîlm li Fransayê bûbû mijara nîqaşan.

Fîlmê Philippe Lioret ê bi navê 'Welcome' ku mijara wê penaberî û evîna du ciwanên kurd e xelatek jî ji Parlamentoya Ewropayê wergirt. Bi xelatgirtina fîlm ve ji bo fîlmê dê 23'ê zimanên YE'yê bin nivîs bê amadekirin, versiyona fîlmê ya orîjînal ji bo kesên kor û ker bê çêkirin û hemû lêçûnên fîlmê bên fînanse kirin. Bi giştî ji bo fîlmê 87 hezar euro xelat bê dayîn.

Di fîlmê de mijara nêzîkahiya hikumetê ya li hember penaberan û cezayên ku ji bo kesên alîkariyê didin van li Fransayê gelekî hatibû nîqaşkirin. Li Fransayê ji bo hemû kesên ku alîkariyê bidin penaberan cezayê girtîgehê yê 5 salan û cezayê pereyan heta 30 hezar euro derdikeve tê dayîn. Loiret got: "Di mijara guhertinan zagonen de hin guhertin pêk bên ev dê serkeftinek be." Derhêner pêşniyara parlamenterên sosyalîst ku ji bo rastkirina zagonê ji aliyê partiya UMP'ê ku li Fransayê îktîdar e rexne kir û wiha got: "Tu parlamenterekî UMP'ê wê demê tevlî nîqaşan nebûbû lê ji bo dengên dijî sererastkirina zagonê bidin hatin dengdan." Ji ber ku derhêner pirsgirêkên ku penaber dijîn şibandibû pirsgirêkên ku cihû yên ku di salên 1943'an de jiyane lê ev şibandin ji aliyê wezîrê koçberiyê Eric Besson ve rastî bertekan hatibû. **STRASBOURG**



**Arjen Arî**

arjenari99@yahoo.com

## Bi hêviya cejna gewre

Destek an jî destin geh dihingive/in destikê deriyê li ber vekirinê û derî tête vekirin; geh destine din heman deriyê bi qasî ku mirovek tê re bibihure, vekirî, û her kes li bendê ku derî heta piştê vebe û ew jî tê re bibihurin; dibînin ku bi carekê re bi dahfdana himeta hêzeke hêznêdiyar, derî mîna ku çimekî jî venebûbe, hatê girtin.

Hinin, di vê pêvajoya derîvekirina li neçareseriyên li heviya çareseriyê, weke zarokên zirz î şûm ji daran û vekirina derî hez û çoşê werdigirin!

Weke gotina pêşiyên Çîniyan, ' riya herî dirêj bi pêngavekê dest pê dike'; derî jî bi biryara destine biryardar an vedibin, an jî ên li ber vekirinê têne girtin!

Bi qasî ku girtin û vekirina deriyê li ber vekirinê sed carî, bi sed şêweyî, li sed cihî bi gotinên gotindaran re têt vekirin û têt girtin; kurdan, bo ku hêviya meriv ya di derbarê hêvîkirinê de neşike, zindî bimine; gotinek xweşbîn li şûn xwe hiştine: Hoste necar, rabe reze weke hercar; Xweda yek e, dergeh hezar'!

Dergehê jiyînê hezarûyek bin jî li ber mirov, deriyê dewletê, dewlata ku xwe ji jor de veristiyê û kiriye tevna pîrê li ser serê mirovan du ne: Yek, dariyê dadê; du, deriyê bêdadiyê!

Li ser axeke ku dad bi kemenda bêdadayê bi dest û zendên bed û bedbînan hatibe girêdan, û sed zewr û zext lê hatibe dan; ne dadgeh û dadger; dozger, dozgerên ku karin/dikin gêra gavanan bi hemwelatiyan welatê dagirkirî bikin, û wan sed caran bibîn û bînin ber dergehê dadgehên bêdadiyê; derîdergehan bi doznameyên şêt û kirêt tînin keviya girtinan.

Wekî mînak, dad hebûya, Meclîsa li şer kavilê Dewlet î Alî avabûyî piştî 80 salên bihurî di ser damezrandina komarê re dê ne li nermkirin û sistkirina zagonên di derbarê ' Têkoşina li dijî terorê'; di roja zarokên cîhanê de dê li riyên berdana zarokên di zîndanan de ku ji bo kuçtêwerkiran li polisan hatine girtin, bigeriya!

Wisa dixuye ku ew zarok weke mezinên xwe yê bi çiyan ketî, di çavên dadê û xwediyên dadê de potansiyelên xeternak ên siberojê ne?

Ev zarok weke yên bi çiyan ketî û yên di hûndir û yên dersînor bûyî di çavên dada bêdad de weke mêlaka gelekî hatibûya dîtin û hesibandin, xwediyên dadê dê li ferhenga gotin û biwêjên pêşiyên kurdan meyzandina, ka kurdan di vê biwarê de gotinek li dû xwe hiştine, an na!

Kurd ji serdestên xwe bêhtir û gellektir xatirdar û rûmetdar in ku ev gotin li dû xwe hiştine: Meriv kuçik dide xatirê xwedî!

Ev, xatirê xwedî nizanin/nezanîne ku xatir bidin zarokên wî!

Xatir hebûya stûyê Şeyid Rizayê ku riha wî bi qasî keska pêximber pîrozwer, û piyekî wî li vir yek li hêla din dişeniqandin?

Xatir hebûya zarûzêç weke pezê col diajotin xaniyekî û tev dikirin komira ku rûyê komarê hê jî pê reş e?

Xatir hebûya, bûkên yek mehî, zarokên bi çil xwe jor de m^îna pirpirîkên li dora agir, xwe davêtin ava Munzir?

Piştî waka asaq û sintaqan niha, ku rabibûna û weke mêran bigotina me hûn bindest kirine, em jî vê sezayê li we rewa dibinin, willehî, billehî, tillehî ez ê pê neêşiyama; bi ser de min ê bigota,' Weyy bijîn, ha wisa'!

Li çar nikarê dinyayê, - Tirkiya ku ji tirkan pê ve ne ya yek kesî ye, ne tê de- ji vir heta ku bigihe welatên reşik û zerik û çavhûrikan, welatên vegirtî/dagirkirî bi dada taybetî xwe têne rêvebirin. Û me ne Waliyê Herêmê ji bîr kiriye, na jî salên ku serê mirovan li 'herêmê' bi pîvazekê bû!

Ji vê bîreweriya şa'irkî, di hevdîtina li gel serbalyozê Qerantiya Holandayê de li ser pirseke aresteyî min kirî min ev bersiv dayê: Berêz…belê; hûn bêdestûr û bêyî ku hinek bangî we bikin, we vexwînîn ser axa xwe û we bikin mêvan; hûn bi hemû hêza xwe ya zor ketin war û welatên xelkê û we xwest hûn wan war û wargehan ji xwe re bikin çêrewar.

Piştî vê tevgera we ya navnetweyî ya lihevparvekina erd û axê, navek li we hate kirin, û xelk û alemê ji we re gotin, ' Kolonyalîst'!

Ez dibînim ku hûn, îro mîna ku bixwazin xwe ji gunehên xwe daweşînin, mîna ku hûn bixwazin 'xwedîti'ya xwe ya nû şanî dinyayê bidin, hûn radibin ji Efrîkaya Başûr, ji axa Karayîban 'reşikan xwe' li ser navê wejê û hûnerê li dinyayê digerînin…

Berêz, ev ê bi we re, demekê reşikên we, xulam û navmalî û malê we bûn!

Weke gotina kurdan, ' li jor Xweda, li jêr hûn bûn'!

Hûn dagirker û kolonyalîst bûn!

Mixabin berêz, mixabin navê welatê min ê vegirtî/dagirkirî/pinpêkirî ne kolonî ye jî!

Niha ez reşik im an reşikên bi we re reşik in?

Rêzdar, bi baldarî li yê werger dihisand…carinan li min dieyşand di bin çavan re, carinan jî bi serê xwe her gotin disediqand!

Lê, bi hevoka dawî re, bi pirsa kirî re rêzdar bêhemdê xwe mizicîbû, û mîna ku bixwaze wateyêke din li pirsa min bar bike, bişirî bû!

Êm ê rojekê bibişirin.

Bişirîna me dê hilperike rû yê.

Ev bişirîn dê bike ku ev tev bi hev re bibin xwediyê kenekî gewre.Kenekî bi tiqe-tiq

Sibê, sihara zû, ku hinekan li deriyê we bidin,û hûn rabin derî vekin û binerin ku zarokin hinarkbîhokîn, çav peşik reşik bi biriqîn ji we re bi bişîrîn bibêjin, 'Cejna we pîroz be'; hûn jî bi wan re bibişirin û vêya bibêjin ji kerema xwe:

--Cejna we jî zarokno, cejna we jî…bi hêviya CEJNA GEWRE, ROJA AZADÎYÊ!

# Bîranîn



Mehmet Kadrî Çîçek (Mazlûm)
1970 Amed 16.01.2003
Qada Apê Mûsa Amed

*Ji bo welatekî azad*
*Ji bo jiyaneke bi rûmet*
*Ji bo zarokên gul bi ken*
*Ji bo dayikên dest bi hine*
*Ji bo evîn û hezkirinê*
*Ji bo meşa we ya pîroz*
*SILAV*
*SILAV*



Mahmût ÇÎÇEK (Şoreş)
1974 Amed 28.11.1995
Yayladere Çewlik

**Li ser navê malbata Çîçek birayê wî Abdurahman Çîçek**

ROJEV
27 Mijdar 2009 Hejmar: 15 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Li Êlihê Tenîsa Masê

Êlih ji bo Lîga Tenîsa Masê ya Tirkiyeyê mêvandariyê dike. Lîg ji 4 periyodan pêk tê û musabeqeyên periyoda 3'yemîn li Êlihê tên lîstin. 16 tîmên mêr û 16 tîmên jin bi giştî 32 tîm li salona girtî ya navenda Rehabilîtasyonê têdikoşin. Di dawiya periyodan de 8 tîmên serkeftî dê beşdarî musabeqeyên bêjandinê (play offê) bibin. Di Lîga Super ya Tenîsa Masê de tîma Êlihê ya jinan Êlih Gençlikspor jî têdikoşe. **ÊLIH**



# Bazara cejnê gel bextewar nekir

Îra cejna Qurbanê ye û sewalfiroşan diyar kirin ku bazara cejnê ew bextewar nekirine. Sewalfiroşan destnîşan kirin ku îsal ji ber krîza aborî di bazaran de zindîbûnek tunebû û gotin ku îsal di warê aborî de têk çûne. Her wiha welatiyên ku dixwazin wecîbeyên xwe yên olî bînin cih jî ji ber buhayan bi gazinc in.

Îsal ji bo Cejna Qurbanê ji gelek bajaran sewalkaran sewalên xwe anîn mazadên Îzmîrê. Sewalfiroşan sewalên xwe li bazaran ku şaredariyê tahsîs kiribûn bi cih kirin. Îsal ji ber krîza aborî buhayê sewalan ji sedî sed zêde bûn. Her wiha hem sewalfiroşan û hem jî welatiyan para xwe ji vê krîzê girt. Hem sewalfiroş hem jî sewalkar ji vê rewşê bi gazin in û nerazîbûnê nîşan didin. Sewalfiroşê bi navê Sadik Çinar ku ji navçeya Girê Sora Rihayê ji bo ku qurbanan bifiroşin hatiye Îzmîrê nerazîbûnên xwe anîn ziman û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di serî de ez dixwazim bibêjim ku em li vir di bin şert û mercên nehijyenîk de dimînin. Em tu hewcedariyên xwe nekarin bînin cih. Ne tuwalet, ne av û ne jî tiştek dî heye. Min 25 dewar anîn vir. Heta niha 10 heb hatine firotin. Yanî îsal qet sewal nayên firotin. Hêviyên mezin bûn lê mixabin hemû têk çûn. Serê dewarî em bi 3 hezar TL'yî difiroşin. Lê mixabin nayên firotin."

**Îsal ji ber krîza aborî di nava gel de bextewarî tuneye. Buhayê qurbanan li gorî salên din ji sedî sed zêde bûye. Welatiyên ku dixwazin wecîbeyên xwe yên olî bînin cih ji ber buhayan bi gazinc in**

Welatiyê bi navê Hîkmet Yok ku ji navçeya Erdîşa Wanê hatiye Îzmîrê jî nerazîbûnên xwe anîn ziman û diyar kir ku îsal bi zehmetiyên mezin re rû bi rû mane. Welatiyên ku dixwazin wecîbeyên xwe yên olî bînin cih ji vê rewşê nerazî ne û gotin ku îsal tenê tên li qurbanan dinêrin û diçin. Kesê bi navê Nevzat Koçal ku ji bo qurbanê bikire hatibû bazarê diyar kir ji bo buha gelek zêde ye nikare bikire û destvala diçe mala xwe. Koçal wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji ber krîza aborî em nikarin debara xwe bikin. Me dixwest ku em wecîbeyên xwe yên olî bînin cih. Lê ji ber ku buha gelek zêdeye em nikarin vê daxwaza bînin cih. Ez mehê 900 TL maaş digirim. Min heta niha ji bo qurbanê 3 hezar TL berhev kiribû lê niha ez destvala diçim mala xwe. Em dibînin ku krîza aborî bandoreke kûr li me kiriye." **ÎZMÎR (DÎHA)**



## Ji bo şaredariyê makîneya çinîna giha



Genpower Jeneratorê 5 heb makîneyên çinîna giha û makîneyên jeneratorê dan şaredariya Bajarê Mezin a Amedê. Nûnerên fîrmaya Genpower Jeneratorê makîneyên çinîna giha û jenerator teslîmê Midûriyeta Baxçe û Parqan kir. Şaredarê Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr spasiyên xwe pêşkêşî midûrê fîrmayê Aytaç Ozkartal kir. **AMED**

## Li Êlihê di cejnê de wesayît bê pere ne

Şaredariya Êlihê bi wesîleya Cejna Qurbanê sê rojan otobusên şaredariyê bê pere dixe xizmeta gel.

Şaredariya Êlihê bi armanca ku Cejna Qurbanê bi awayekî baş derbas bibe gelek xebat pêk anîn. Ekîbên zabitaya şaredariyê dê di cejnê de kontrolên xwe bidomînin. Her wiha şaredariyê îlan kir ku dê sê rojên cejnê otobusên şaredariyê bê pere di xizmeta gel de bin. Ekîbên zabitaya trafîkê dê di cejnê de bê navber bixebitin. **ÊLIH**

## Çavkaniya debarê tune dibe

Xwedîkirina sewalan di salên 90'î de li Wanê gelek pêş ketibû. Sewalên ku li Wanê dihatin xwedîkirin îhracata wan dihate kirin. Lê di salên dawî de ji ber polîtîkayên şaş ên dewletê sewalkarî anî asta tunebûnê. Komeleya Xwedîkirina Sewal û Qesaban a Wanê ku nêzî 270 endamên wê hebûn 170 jê winda kir û niha bi girtinê re rû bi rû ye.

Wan salên borî di warê sewalkariyê de li Tirkiyeyê cihekî girîng digirt. Îran, Iraq û Rûsyayê sewal ji Wanê dikirî. Li Wanê sewalkarî çavkaniya debarê bû. Lê ji ber polîtîkayên dewletê sewalakî tune dibe. Der barê vê rewşê de hikûmet tu tiştekî nake. Saziya Civakî ya Sîvîl ya herî mezin VATSO'yê der barê vê de projeyek amade kir lê mixabin ev jî bê encam ma.

**'Sewalkarî qediya'**

Serokê Komeleya Xwedîkirina Sewalan û Qesaban Abîdîn Kasapoglu jî axivî û wiha got:

"Di salê 1990'î de gund hatin valakirin. Piştî vê sewalkarî jî her çû ji holê rabû. Wezareta Çandiniyê di vî warî de piştgirî neda sewalkaran. Me gelek caran hevdîtin bi wezaretê re pêk anî. Lê wan di şaşiyên xwe de israr kir. Komeleya me jî bi girtinê re rû bi rû ye. Berê 270 endamên me hebûn. Lê niha daketiye 100.

Ev 30 sal in em cara yekemîn tiştekî wisa dibînin. **QERS**




## Dara mazî îcar stû li ber hezazê tewand

*Li çiyayên Çewlîgê darên mazî hema her sal ji aliyê leşkeriyê ve tên şewitandin. Lê darên mazî yên çiyayên kurdan bi rika neyarê xwe ya ku ew dişewitînin ji nû ve bi awayek geş û gur şîn dibe. Lê vê carê dara xemla çiyayên kurdan ne ji ber şewatê, ji ber hezazê stû tewand. Li herêmê bo ku hezaz axa heyî diherikîne û dibe rahên darên kevnar vala dimînin û hişk dibin.*

## Çîkolata pêşî li pîrbûnê digire

Li gor lêkolînan ji bo hêdîkirina pêvajoya pîr û qermiçîna postê laşê xwe çîkolata reş (bitter) bixwin.

Lêkolîner diyar dikin ku çîkolata reş postê laşê mirovan bedew û ciwan radigire.

Û ji bilî vê wê li hemberî hin tîrêjên negatîv yên tavê diparêzin.

Lêkolerên Ingilîzî diyar dikin ku her çend ku çîkolata reş tesîra herî zêde datîne ser çermê mirovan, lê divê em bizanibin ku çîkolata hesta êrişkeriyê jî li însanan diafirîne.

Zanyarên zanîngeha Karadiv jî aşkere kirin ku encamên lêkolînên li ser 17 hezar û 500 kesan nîşan didin ew ên ku di zaroktiya xwe da çîkolata xwarine di temenê 30 saliya xwe de hesta wan ya êrîşkariyê hebûye. *(hawarnet)*



www.arsivakurdi.org